



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 31

Rahên Ayîna Sûmerî di Ayînên Asîmanî da

Li gor dîtina ayînî ya îro, ayîna sûmerî wek ayîneka putperest û gawir tê hejmartin. Lê belê lêkolînên zanistî pir delîlên bibawer pêşkêş dikin ku di ayînên asîmanî da (Cihûtî, Kirîstiyani, Misilmantî) rah û dêlîndêzên ayînî sûmerî hene - belê wisa hatine guhartin, daku bi bingeha ramanî ya van hersê ayînan ra biguncin. Evin hin dawer (delîl):

Hin dawer û hin embaz (model):

- **Navê "Allah"**: Navê "**Allah**" berê di bermaya çanda gelên biyabanî da li rojavayê Asiyayê bi şêwazê "**Îl**" hebû. Xwedawend "**Îl**" serekê Pantheona Ken'anî bû û serekê xwedawendên Pantheona finîqî li Ogarêt bû. Ji taybetmendiyên wî li ba Fînîqîyan ew bû ku bi dirûve ga dihate nîşankirin. Ew wisa dihate resimkirin ku ew li ser erşê (عَرْش) rûniştiye, rih û du qilochên (qoçên) wî hene. Navê wî li ba Cihûyan bi şêwazê "**Êlohîm**" (*Elohim*) hatiye gotin. Ev şêwazê gelemariyê ji bo bilindkirina asta wî. Ereban di dema pêş Îslametiye da "**Allah**" wek Xwedayê payebilind didîtin ku li tenîştaya wî hin xwedayên din yê astnizimtir hene¹.

Akkadî ji gelên biyabanî yê pêşîn bûn ku welatê Sûmer dagîrkirin û ji çanda wan pir tişt wergirtin. Xweda "**Enlîl**" (*Enlîl*) yek ji mezinên xwedawendên Sûmer bû. Yek ji navên wî bi zimanê akkadî "**El-lil**" bû û bi vî şêwazî ew nav derbas ba Babilî û Aşûriyan bû; û di Cihûtiyê da bi şêwazê "**Elohim**" (*Elohim*), di Kirîstiyaniyê da bi şêwazê "**Eloyî /Îlî**" bi wateya "**Îlhî**" (Xwedayê min) hate xuyakirin ku pêximber Îsa li ser xaç dubare kiriye, û di bermaya erebî da bi şêwazê "**Allah**" xuya bûye².

Xwedawend "**Enlîl**" (*Enlîl*) beşek bû ji ayîna sûmerî-şemsanî (tavî, rojeyî), û ew li ba Yûnanan bi şêwazê "**Helios**" (*Hélios*) maye. Piştî wê ew nav bi şêwazê nû "**Îl /Allah**" li ba gelên xwedî çanda biyabanî bû beşek ji baweriya heyvî (qemerî), û êdî heyv ku dişibihe herdu qilochên (qoçên) ga bû nîşana wî³.

- **Afirandina Gerdûnê**: Sûmeran wisa bawer dikir ku deryayek hebû jêra digotin "**Nemmû**" û ji wê deryayê asîman "**An**" û erd "**cî**" peyda bûn. Di pey ra Xweda "**Enlîl**" ew herdu ji hev cudakirin; asîman êdî bû banek û di pey ra roj, heyv û hemû exter û stêrkên mayîn hatin afirandin. Paşê dar û ber û jîndar hatin afirandin û mirov jî li ser axa zemînê hatin afirandin. Wan wisa bawerdikir ku awayê afirandinê bi peyva xwedayî "**bibe**" dibû; bawerdikirin ku her afrînerek li gor rê û resmên xwedayî birêva diçe⁴.

Gotûbêja afirandina gerdûnê di Cihûtî û Kirîstiyaniyê da dişibihe baweriya Sûmeran. Li gor Cihû û Kirîstiyanan di destpêkê da giyanê Xweda li ser avê liba dibû. Di roja pêşî da Xweda ronahî afirand û navbera wê û tarîtiyê cudakir. Di roja duwem da asîman ji deryaya destpêkî afirand. Di roja sêhem da erd ji deryaya destpêkî afirand û dar û giya peyda kirin. Di roja çarem da exter û stêrk afirandin. Di roja pêncem da jîndar (heywan) afirandin. Di roja şeşem da mirov di dirûvê xwe da afirandin û Xweda di roja heftem da bihna xwe veda û vehesiya⁵.

Gotûbêja afirandinê di Islametiyê da jî dişibihe gotûbêja tewratî. Di Qur'anê da hatiye: "**Ma Ewên nebawermend nabînin ku asîman û erd bi hev va bûn û me ji hev cudakirin û me ji avê her tiştê jîndar peyda kir**" {أَوَلَمْ يَرَ الَّذِينَ كَفَرُوا أَنَّ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ كَانَتَا رَتْقًا فَفَتَقْنَاهُمَا وَجَعَلْنَا مِنَ الْمَاءِ كُلَّ شَيْءٍ حَيًّا} Yanê asîman û erd bi hev va bûn û me ew ji hevdu cudakirin. Dîsa di Qur'anê da hatiye "**Me asîman kir banekî parastinê**". {وَجَعَلْنَا السَّمَاءَ سَفًّا مَّحْفُوظًا}. Dîsa hatiye "**Xwedayê we asîman û erd di şeş rojan da afirand û di pey ra li ser erşê rûnişt**". {إِنَّ رَبَّكُمْ} Awayê afirandinê di Îslametiyê da jî bi peyva "**Kun feyekûne**" (bibe û bû) pêktê. "**Peyva me ji tiştan ra ewe ku dema me xwast em dibêjin bibe û dibe**" { إِنَّمَا قَوْلُنَا لِشَيْءٍ إِذَا أَرَدْنَاهُ أَنْ نَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ }⁶.

- **Afirandina mirov**: Xwedawend di ayîna sûmerî da du beşin: Xwedawendên "**Anunnaki**", wedyên peywîrên serwer û xwedawendên "**Igigi**", yên ku bi kar û peywîrên zor û giran radibin. Piştî pir salên kar, xwedawendên "**Igigi**" li dijî serekê xwedawendan "**Enlil**" serî hildan. Rabû "**Enlil**" ji xwedawenda jin "**Ninto**" xwast ku mirovan ji bo xizmetkirina xwedawendan biafirîne. Wê 14 perçe ji heriyê birin. Xwedawend "**Enki**" ew 14 perçe bi xwîna xwedawendekî gorî bi navê "**Genco**" tevlihev kirin û "**Ninto**" heft kesên nêr û heft kesên mê çêkirin. Navê ev afirînerê nû bi zimanê sûmerî danîn "**Lulu**" (**Lolo**)⁷.

Di gotûbêja tewratî da hatiye ku Xweda Adem ji heriyê çêkiriye "**Xweda Adem ji axa erdê pêkaniye**". {وَجَبَلْنَا الرَّبُّ إِلَهُ آدَمَ تَرَابًا مِنَ الْأَرْضِ}. Gotûbêja îslamî jî dişibihe ya tewratî. Di Qur'anê da hatiye: "**Me nifşê mirov ji heriyê afirandiye**". {وَلَقَدْ خَلَقْنَا الْإِنْسَانَ مِنْ سَلَالَةٍ مِّن طِينٍ}. Daîsa hatiye "**Destpêka afirandina mirov ji heriyê bû**" {وَبَدَأَ خَلْقَ الْإِنْسَانِ مِنْ طِينٍ}⁸.

- **Gotûbêja Tofanê**: Di gotûbêja sûmerî da hatiye ku mirov li ser rûyê zemînê pir bûne, û ji dest qîreqîr û qîjeqîja wan xwedayan nikarîbûn binivîn (razên, xewbikin). Xwedayan nexweşî û pirik bi ser wan da barand û di pey ra xela û birçîbûn, daku hejmara wan kêmbikin. Lê ew kêmbûn. Di pey ra biryar dan ku wan bi **Tofanê** biwestînin. Xwedawend "**Enki**" ev nûçe bi nehîni gihand mirovê xwedahez "**Ziusudra**". Li ser pend û şîreta "**Enki**" "**Ziusudra**" keştiyek duristkir, hemû malbat û xizimên xwe, hebûna xwe û hin jînewer jî xistin keştiyê. Wisa ew ji **Tofanê** rizgar bûn û keştiya wî li ser çiyayê "**Nisir**" li başûrê Kurdistanê rawestiya. Navê wî çiyayî bi kurdî "**Pîre Megrûn**"-e⁹.

Li gor gotûbêja tewratî jî hejmara mirovan pir bûye û pir karên xirab kirine. Xweda li ser afirandina wan poşman bûye, û biryar daye ku wan bi **Tofanê** qirbike. Ferman daye pêximber **Nûh** ku keştiyekê durist bike, malbata xwe û ji her texlîtekî jîneweran cotekî têxe keştiyê. **Nûh** wisa kiriye û keştiya wî li ser çiyayê "**Ararat**" (**Agirî**) rawestiyaye, û wisa ew û yên li gel wî rizgar bûne. Ji wir mirovatiyê heyama xwe ya duwemîn destpêkiriye¹⁰.

Gotûbêja qur'anî jî dişibihe ya tewratî. Li gor wê jî, mirov ji Xweda asê bûne. Pêximber **Nûh** ew 950 salî vexwendine guhdarkirina peyvên Xweda, lê wan pê bawer nekiriye. Xweda **Tofan** bi ser wan da aniye. Ji **Nûh** xwastibû ku keştiyekê durist bike. Ferman daye wî ku ew malbata

xwe û ji her texlîtekî jîndaran cotekî têxe keştiyê. Keştiya *Nûh* li ser çiyayê "*Cûdî*" rawestiyaye. Ev çiya hên jî bi vî navî li nawenda Kurdistanê tê naskirin. Ji wir mirovatiyê heyama xwe ya duwemîn destpêkiriye¹¹.

Hin belge û modelên din jî hene ku hebûna rahên ayîna sûmerî di ayînên asîmanî da (Cihûtî, Kirîstiyani, Misilmantî) piştrast dikin. Yek ji wan çandina dara jîyanê di bihuştê da ye, baweriya bi qeda û qederê ye, û gotûbêja herdu kurên Adem (ku *Qabilê* cotkar birayê xwe *Habilê* şivan kuştiye). *Qabil* di gotûbêja sûmerî da xwedawend "*Enkmiro*" ye û *Habil* jî xwedawend "*Demûzî / Temûz*" bûye.

Yek ji nimûneyan jî gorîkirina berxekî li cihê gorîkirina mirove. Ev di gotûbêja pêximber *Îbrahîm* û kurê wî *Îshak* (li gor Tewratê), kurê wî *Îsmail* (li gor gotûbêja îslamî) hatiye xuyakirin. Nimûneyekî din jî navê bi lexem "*Qidîs*"-e. Ew ji navê sûmerî "*Qadiştu*" hatiye. Ew nav bi lexem ji oldara perestgehê ra dihate gotin. Belkî ji oldarê perestgehê ra jî bi şewazekî din hatibe gotin¹².

Çarşemb, 28.10.2015

Jêder

¹ Rene Labat û hinên din: Zincîra efsaneyên sûrî, rûpel 432, 433. Francis davidson û hinên din: Şîrovekirina pirtûka pîroz, rûpel 146. Ehmed Sûse: Berfirehiya Ereb û Cihûyan di dîrokê da, rûpel 485. Khezal El-Majidi: Baweriyên aramî, rûpel 79

² Seyid Mehmod El-Qimni: Çîroka afirandinê, rûpel 36. Tewfiq Suleyman: Lêkolîn li şaristaniyên rojavayê Asiyayê ya kevin, rûpel 100.

³ William Durant: Çîroka şaristaniyê, 6/321. Hesen Nihme: berfirehiya mîtologî û efsaneyên gelên kevin, rûpel 105.

⁴ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 152-153, 156. Wedih Beshur: Sûmer û Akkad, rûpel 180, 183. Seyid Mehmod El-Qimni: Çîroka afirandinê, rûpel 35.

⁵ Pirtûka heyama kevin: Rêwîtiya afirandinê, Eshah 1, ayet 1-31.

⁶ Sûreyê El-Enbiya, ayet 30 û ayet 32. Sûreyê El-Ehraf, ayet 54. Sûreyê El-Nehil, ayet 40.

⁷ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 191. Se'îd El-Xanimî: Destana afirandin û Tofanê, rûpel 12, 17, 18. Seyid Mehmod El-Qimni: Çîroka afirandinê, rûpel 26-27. Komek ji nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 317.

⁸ Rêwîtiya afirandinê, Eshah 2, ayet 7. Sûreyê El-Mu'mînîn, ayet 12. Sûreyê El-Sejde, ayet 7.

⁹ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 161. Fadil Ebdulwaid Eli: Tofan di jêderên asîmanî da, rûpel 64. Se'îd El-Xanimî: Destana afirandin û Tofanê, rûpel 12-14, 133-137, 144, 145.

¹⁰ Rêwîtiya afirandinê, Eshah 6, ayet 1-24.

¹¹ Sûreyê Hod, ayet 36-45. Sûreyê El-Shuera, ayet 119-120. Sûreyê El-Enkebot, ayet 14.

¹² Samuel Kreimer: Ji tabloyên Sûmer, rûpel 191-192. El-Tabari: Jamih El-Beyan, 10/204. William Durant: Çîroka şaristaniyê, Bend 1, rûpel 29.